# Ji Alîyê Rastîya Zarokan ve Vekolandina Metinên Vegêranê yên di Pirtûka Dersa Kurmancî ya Pola 5an da


## Kurte

Armanca vê vekolînê, metinên vegêranê yên ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da cih digirin ji alîyê 'rastîya zarokan' ve vekolandin e. Li gor vê armancê, lihevhatina metinên vegêranê yên vê pirtûkê li jer-hêmanên rastîya zarokan ên bi navê *xweza, pêdivî, bergeh, hewes* û *gerdûna ziman û fehma zarokan* ve hatîye vekolandin. Ev vekolîn li gor yek ji çeşna *rêbaza vekolîna çawanî (qualitative research methods)* ya bi navê *analîza dokumentan* (*document analysis*) ve hatîye çêkirin. Materyala vê vekolînê ji metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an ya ku ji alîyê Wezareta Perwerdeya Neteweyî ve hatîye weşandin pêk tên. Daneyên ku hatine bidestxistin bi *analîza teswîrî (descriptive analysis*) ve hatine analîzkirin û bi daneyên jimarî ve hatine îfadekirin. Paşê ew bi tabloyan ve hatine pêşkêşkirin û şîrovekirin. Di dawîya vê vekolînê da rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa "Kurdî Kurmacî 5" li rastîya zarokan ji sedî 47 derketîye. Ev encama ku hatîye bidestxistin, nîşan dide ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da li rastîya zarokan di hin metinan da kêm mayê û di hin metinan da zêde ye lê belê di piranîya metinan da di rêjeyeke navîn da maye. Ev xal jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da cih digrin yekser li gor rastîya zarokan nehatine amadekirin.


**Peyvên sereke:** Rastîya zarokan, pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an, metinên vegêranê

# 5. Sınıf Kurmanci Ders Kitabındaki Hikâye Edici Metinlerin Çocuk Gerçekliği Açısından İncelenmesi


## Özet

Bu araştırmanın amacı, 5. sınıf Kurmanci ders kitabında yer alan hikâye edici metinleri 'çocuk gerçekliği' açısından incelemektir. Bu amaç çerçevesinde kitaptaki hikâye edici metinler *çocuğun doğasına, ihtiyaçlarına, bakış açısına, ilgisine, dil ve anlam evrenine* uygunluk durumu açısından incelenmiştir. Bu araştırma, nitel araştırma yönteminin bir çeşidi olan *doküman incelmesine* göre yürütülmüştür. Araştırmanın materyalini, Millî Eğitim Bakanlığının 5. sınıf Kurmanci ders kitabındaki hikâye edici metinler oluşturmaktadır. Elde edilen veriler betimsel analizle çözümlenmiş ve sayısal verilerle ifade edilmiştir. Daha sonra tablolar halinde sunulmuş ve yorumlanmıştır. Araştırmanın sonunda, "Kurdî Kurmacî 5" ders kitabındaki hikâye edici metinlerin %47 oranında çocuk gerçekliğine uygunluk gösterdiği ortaya çıkmıştır. Elde edilen bu sonuç, incelenen kitapta yer alan hikâye edici metinlerin bir kısmının çocuk gerçekliğine uygunluk oranının yüksek; bir kısmının düşük olduğunu ancak çoğunun uygunluk oranının orta düzeyde kaldığını göstermektedir. Bu da 5. sınıf Kurmanci ders kitabında yer alan hikâye edici metinlerin çocuk gerçekliğine yeterince uygun hazırlanmadığını göstermektedir.


BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2025 • Cilt/Volume: 11 • Sayı/Issue: 21

**Rozerin Aydın**
rozerin47400@gmail.com
Arş. Gör., Muş Alparslan Üniversitesi
**Orcid:** 0000-0001-2345-6789

**Makale Türü /Article Type:**
Araştırma Makalesi / Research Article
**Makale Geliş Tarihi / Received:** 23.05.2025
**Makale Kabul Tarihi / Accepted:** 21.06.2025
**Makale Yayın Tarihi / Published:** 29.06.2025
**DOI**: 10.56491/buydd.1705260

**Anahtar kelimeler:** Çocuk gerçekliği, 5. sınıf Kurmanci ders kitabı, hikâye edici metinler

## An Investigation of Narrative Texts in 5th Grade Kurmanji Course Book in Terms of Child Reality

### Abstract

This study aims to analyze the narrative texts in the 5th grade Kurmanji textbook published by the Ministry of National Education in terms of their alignment with the concept of "child reality". Within this framework, the texts were evaluated based on their appropriateness to *children's nature, needs, interests, perspectives, and linguistic-cognitive universe*. Employing *document analysis*, which is a type of the qualitative research method, this study utilized narrative texts in the specified textbook as its primary data source. The collected data were examined using descriptive analysis and quantified. Then, they were presented in tabular form to support interpretation. Findings indicate that 47% of the narrative texts in the "Kurdî Kurmacî 5" textbook are consistent with the principles of child reality. This suggests that while some texts demonstrate high relevance, others are less aligned, and overall, the level of appropriateness remains moderate. Accordingly, it can be concluded that the narrative texts in the 5th grade Kurmanci textbook are not fully developed in accordance with the concept of child reality.

**Keywords:** Child reality, 5th grade Kurmanji textbooks, narrative texts

## Destpêk

## 1. Zarok û Edebîyata Zarokan

Zarok di pêvajoya xwe ya ji zaroktî heta mirinê dom dike da, ji malbata xwe bêtir bi xwendingehê ra wextê xwe derbas dikin. Ji ber vê sedemê mirov dikare bibêje zarok jîyanê ji malbatê bêtir bi rêya perwerdeya xwendigehan ve nas dikin. Ji bo perwerdeyeke modern, bikêr û serkeftî divê ewîlî pênaseya zarokbûnê bê kirin. Zarok kî ye û ji kê ra zarok tê gotin divê bê zanîn. Zarok; mirovek e ku ew di heyama navbera zayin û nûciwanîyê da (0-12) yan jî nûciwanîyê jî vedihewîne (0-18) (TÜBA, 2011), kur an keçek e ku di heyama geşedana ku di navebara zaroktî û nûciwanîyê da ye (TDK, 2011), mirovek e ku di çaxa balixbûnê ya ku her dem diguhere û pêşve diçe da ye (Bakırcıoğlu, 2012), mirovek e ku ji aliyê fizîkî, zihnî, hestyarî, zimanî, civakî, şexsî û bîrbirinê ve pêş dikeve û diguhere (Senemoğlu, 2011; Bee û Boyd, 2009; Yavuzer, 2012; Miller, 2008; Cirhinlioğlu, 2010), ew kesê xwedî qabîlîyet, pêdivî û hewesên e ku dikare dinyaya xwe jî li gor wan bişekilîne (Gönen û Veziroğlu, 2013), mirovek e ku xwedî fikirîneke xas û têgihiştinek e cuda ye (Piaget, 2010), xwendekarên saf in ku ji zayînê ve xwedî xwestina nasîn û zanînê ne (Ackermann, 2004). Zarokatî pêvajoyek e ku mirov taybetîyên geşedanêke cur bi cur tê da nîşan dide (Can, 2014).

Zarok di pêvajoya jîyana xwe da bi saya berhemên edebîyata zarokan hînî jîyanê, têkilî û guherînên mirovan, taybetîyên çandên cuda dibin. Edebîyata zarokan navê giştî yê hin berheman in ku ew di merheleyeka jiyanê ya ku ji pêşdibistanê destpêdike û heta serdema nûciwanîyê dewam dike da li gorî geşedana zimanê zarokan û asta famkirina wan; dinyaya hest û fikrên wan bi peyamên zimanî û dîtbarî dewlemend dike û yên ku asta ecibandina wan bilind dike. Di edebîyata ku çavkanîya xwe ji jîyanê distînê da rastîyeke honakî ya bi peyvan hatîye afirandin heye. Ev rastîya ku bi hesasîyeteke hunermendî ve hatîye hûnandin tebekeyên wateyên cuda pêşkêşî xwendevanî dike û ji nerîna hûnermendî ve rastîya mirov û jîyanê nîşan dide (Sever, 2023). Zarokê ku hêj nikare rastî û xeyalê ji hev veqetîne, bi saya gerdûneke honakî bêyî ku rastî rastîyan bê di derheqê gelek tevgeran da dibe xwedî tecribe û bi vî awayî cudahîya di navbera xeyal û rastîyan diceribîne (İpşiroğlu, 2013). Xwendevanê zarok di pêvajoya xwendinê û di dawîya xwendinê da li hişê xwe rastîyeke li gor xwe diafirîne (Gökmen, 2017). Loma rastîyên honakî ên ku di metinên ku muxatabê wan zarok in da cih digrin pêwîst e ku wekî gerdûnekê be ku faîlê wê zarok be û "dengê mezinan" tê da ne serdest be (Şen, 2024).

## 2. Pirtûkên Dersê û Giringîya Metinan

Pirtûkên dersê, alavên perwerde û hînkirinê yên çapkirî nin ku ew agahîyên vehewandîye neqlî xwendekaran dike, li gor rêzikên bernameyên hînkirinê hatine amadekirin û ji metinên dewlemend ên ku li gor asta temen û agahiyên zarokan bi bikêriyên hişî û bihîsî pêk tên (Çeçen & Çiftçi, 2007). Pirtûkên dersan gerdûna zimanê zarokan fireh dike, geşedana zarokan ji hêlên zihnî, zimannasî, exlaqî, zayendî, civakî û hestyarî ve pêşdixîne loma di perwerdeya zarokan da amûrên mihîm in.

Di pirtûkên dersen ziman da, armanc hem hînkirina ziman e hem jî hezkirina ziman û çanda wî zimanî ye. Loma amadekirina rahênan û metinên ku di van pirtûkên ziman da cih digrin gelek mihîm in. Metin yek ji hêmanên herî giring ên pêvajoya hînkirinê ye. Berhemek e zimanî û heyberek e şênber e ku ji bêjeyan pêk tê. Xwedî vegotineke yekparçe ye û dibe mijara xwendinê (Özdemir, 1983).

Li gor naverok û şeklê metinan cureyên metinan hene û li gor wan cureya tên senifandin. Wezareta Perwerdeya Neteweyî, cureyên edebî di bernameyên hînkirina tirkî ya 2006, 2019, 2024an da wekî metinên vegêranê, metinên agahîder û helbestê senifandiye. Di pirtûkên dersen kurmancî da jî ev her sê cureyên metinan hene. Metinên di pirtûkên dersên kurmancî da, bi taybetî jî metinên vegêranê, ji bo geşedan û bîrbûyîna zarokan, hînbûn û hezkirina ziman mihîm in. Zarok di van temenên xwe yên biçûk da ji ber ku teqrîben 10-12 salî nin, ne xwedîyê agahîyên objektîf in ji bo famkirina gerdûnê di hişê xwe da li gor zanabûna xwe gerdûnekê ji rastîyên xwe yên subjektîf diafirînin. Ji ber ku metinên vegêranê xitabî vê rastîya zarokan a subjektîf dike, ji metinên agahîderê bêtir têsîr li zarokan dike û bi alîkarîya gerdûneke honakî gerdûna rasteqîn bi wan dide nas kirin. Ji ber vê jî zarokên pola 5an di çaxên vî temenê xwe da ji metinên agahdarîyê bêtir ji metinên honakî hez dikin.

## 3. Geşedan û Rastîya Zarokan

Lihevhatina metinên vegêranê li rastîya zarokan ji bo perwerdeya xwendekaran pir mihîm e. Ji ber vê xalê ewilî lazim e rastîya zarokan bê nasîn. Rastîya zarokan çi ye? Rastîya zarokan; bidestxistina ferqên têgihiştina rastîyên zarokan in ku ew, rastîyên ne objektîf in lê belê ji hêla zarokan ve wekî rastîyan tên têgihiştin û dîsa rastîya zarokan li gor geşedana zarokan vekolandina xweza, bergeh, hewes, pêdivî û gerdûna ziman û fehma zarokan jî tê bidestxistin (Çer, 2014). Li gor Sahilli (2022) yek ji hêmanên mihîm ya ku rastîya zarokan watedar dike taybetîyên temen û geşedana zarokan in.  Ji bo rastîya zarokan baş bihête famkirin berî her tiştî pêwistî bi nasandina têgihên wekî taybetîyên geşedana zarokan, xwezaya zarokan, bergeha zarokan, bal û pêdivîyên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan heye.

Ewilî ew ê li ser nasandina têgiha geşedanê bê rawestin. Geşeden çi ye? Geşeden bi şertên dîyar ên ji dolgirtinê dest pê dike û heta ku di warên fîzîkî, zihnî, zimanî, hestî û civakî da bigihêje asta dawî guherîna bêsekin a organîzmayê ye. Geşedan pêvajoyek e. Geşedan bê hînbûn û balixbûnê pêk nayê (MEB, 2015). Di pêvajoya zarokatîya mirovan da geşedan di gelek warên cur bi cur da çêdibe. Watedayîna jîyana zarokan û bîrbirina wan; girêdayî geşedana wan a zihnî, civakî, zayendî, exlaqî, hestyarî û derûnnasîyê ye. Li gor Senemoğlu (2015) zarok ji bo van taybetîyên geşedanê hêj negîhaye kamilbûneke temam.

Mirov nikare ji zarokekî hêvîya bîrbûn û şiyaneke wekî mezinan nerînê bike. Lewra ferqa mezinan ji zarokan ne tenê temen e ferqa wan ji hêla geşedanên zihnî, fîzîkî, zimanî, civakî û hwd ve jî heye. Asta famkirin û têgihiştina zarokan û hewes û pêdivîyên zarokan ji yên mezinan cudatir in (Senemoğlu, 2015). Rastîya zarokên ku bi nirxên cuda li dinyayê dinêre û bi têgihiştineke cuda derdora xwe îdraq dike û rastîya mezinekî ji hev pir cuda nin. Li gor vê xalê rastîya ku her zarokek xwe bi xwe disêwirîne, li gor serdema geşedana wan diguhere û subjektîf e. Ji ber vê sedemê berhemên ku ji bo zarokan tên amadekirin jî lazim e li gor vê qaîdeyê bên amadekirin (Çer, 2016).

Li gor Şimşek (2004) qenaetên geşedanê yên ku bi awayekî gelemperî hatine qebûlkirin, merheleyên zarokatîyê ev in: merheleya zarokatîya ewil (early childhood) û zarokatîya axerîn (late childhood). Ji ber ku mijara vê vekolînê li ser rastîya zarokên pola 5an in merheleya zarokatîya axerîn dikeve nava mijara vê vekolînê. Celal (2024) di xebata xwe da pênc hêmanên sereke û jêr-hêmanên rastîya zarokên pola 5an daye. Li jêrê ev hêmanên sereke yên rastîya zarokan hatine îzahkirin û jêr-hêmanên wan hatine dayîn:

## 3.1. Xwezaya Zarokan

Famkirin û nasîna xwezaya zarokan ji bo amadekirina metinên ku bikaribe xitabî rastîya zarokan bike, pêwîstîyeke mihîm e. Di xwezaya ku mexsûsê zarokan e, hin taybetîyên ku ji zayînê ve pê ra tên hene. Taybetîyên wekî meraqkirin, xeyalkirin, kelecanîbûn, tevgerdarbûn, û jidilbûna zarokan pêwîstîyên mexsûsê xwezaya zarokan in (Çer, 2016). Ji bo perwerdeyeke baş pêwist e ku metinên vegêranê yên di pirtûkên dersan da li gor van taybetîyên xwezaya zarokan bên amadekirin. Jêr-hêmanên xwezaya zarokan ev in; meraq, şîyana xeyalkirinê, kelecanî, tevgerdarî û jidilbûn.

## 3.2. Pêdivîyên Zarokan

Pêdivî; halê tengezarîyeke hundirîn e ku ji ber daxwaz, meylekê yan jî ji ber kêmasîyeke têrnebûyî ve derdikeve holê (Bakırcıoğlu, 2012). Hewes û pêdivîyên her zarokî ji hev cuda ne. Lê belê, hewcedarîyên giring ên wekî hezkirin, jê hezkirin û pêbawerîyê hene ku ew ji bo hemî zarokan hevpar in. Her çiqas zanîn û tecribe zarokan bi sînor be jî eleqeya wan ya li tiştên derdora wan bê sînor e. Di vî warî da bersivandina pêdivî û hewesên zarokan di dinyaya wan ya xeyalî da ji ber ku bingehekê ji bo afirandina rastîyên subjektîf ên zarokan saz dikin mihîm e. Jêr-hêmanên pêdivîyên zarokan ev in; hezkirin, bawerî, jiyîn, tecribe û kişfkirin, xwedî qedirbûn, diltenikî, berpisyarî, huner û afirînerî, hevkarî/ bi komekê ve girêdayîbûn, xweserî.

## 3.3. Bergeha zarokan

Bergeha zarokan; bi çavê zarokan li bûyer, rewş û lehengan nerîn û li gorî wan şîrovekirin e (Şirin, 2016). Bergeha zarokan li gor taybetîyên temen û geşedana zarokan diguhere. Geşedana zihnî ya ku domdike dibe sedema guherîna tecribe û bîrbirina zarokan û ev jî xwedî bandor e li ser guherîna taybetîyên temen û geşedanê (Sahilli, 2022). Zarok ji ber temen û geşedana xwe li gor mezinan bi awayekî cuda wate didin dinyayê û jiyanê. Ji bo wesfdarbûna pirtûkên dersan, xîtapkirina wan ya li bergeha zarokan xaleke mihîm e. Jêr-hêmanên bergeha zarokan ev in; lehenga zarok, nerîna zarokan.

## 3.4. Hewesên Zarokan

Hewesên zarokan li gor taybetîyên zarokan ên wekî geşedan, temen û zayendê ve diguherin. Zarok di merheleya zarokatîya xwe ya ewil da bi xêra lîstikên balkêş ve dest bi nasîna derdora xwe dike. Di merheleya pêşdibistanê da; di zarokên ku sînorê dinyaya xeyalên wan geş dibe da fikra xweperestbûnê heye. Di merheleya dibistanê da; zarokên ku şiyana civakî û kesayetî geş dibe jî hewesa wan li ser çeşnên serguzeştî ne. Di merheleya nûciwanîyê da; zarokên ku berê wan li derve ye xwedî hestên xweserîxwaz û xweperestbûna nûciwanîyê ne. Zarok di vê merheleyê da bi keşfkirina bedenê xwe ve dest bi eleqedarbûna dijzayenda xwe dike (Sahilli, 2022). Zarokên pola 5an yên ku ji merheleya çaxê dibistanê derbasî nûcewanîyê dibe, di navbera 10-12 salî da ye. Li gor Kıbrıs (2016) zarokên çaxê dibistanê di salên ewil da bala xwe didine metinên serguzeştî lê belê piştî pola 5an êdî bala xwe didine mijarên razber jî. Keçên di vê merheleyê da bêtir bala xwe didin tekilîyên derdora xwe û hevalên xwe lê belê kurên di vê merheleyê da bêtir bala xwe didine mijarên tarîxî. Jêr-hêmanên hewesên zarokan ev in; meraq û serpêhatî, werzîş, tarîx, qehremanî, xweza, fen/zanist.

## 3.5. Gerdûna Ziman û Fehma Zarokan

Bergeh, hewes û gerdûna ziman û fehma zarokan li gor emir û taybetmendîyên geşedana zarokan diguhere. Di encama pêşveçûna berdewamî a zîhnî da guherîna tecribe û têgihiştina zarokan ya li gel derdorê jî li ser van guherînan xwedî bandor e (Sahilli, 2022). Yanî ev orjînalîteya xweser a têgihiştin û famkirina ku di gerdûna fêhma zarokan da heye li gor temenê her zarokî diguhere (Eroğlu, 2016). Bi kurtasî mirov dikare bibêje guherîna geşedana zihnî ya zarokan bandor li pêşketina gerdûna ziman û fehma zarokan dike. Dîsa pêşketina gerdûna ziman û fehma zarokan bandor li geşedana zihnî ya zarokan dike. Jêr-hêmanên gerdûna ziman û fehma zarokan ev in; zimanekî sade, gerdûna peyvan, gencîneya peyvan, li gor gerdûna zarokan vegotin.

## 4. Ji Alîyê Rastîya Zarokan ve Giringîya Metinên ku di Pirtûkên Dersê da Cih Digrin

Rastîya zarokên ku bi nirxên cuda li dinyayê dinêre û bi têgihiştineke cuda derdora xwe îdraq dike û rastîya mezinekî ji hev pir cuda nin. Li gor cudabûna geşedan û têgihiştina rastîya zarokan ji mezinan, lazim e perwerdeya wan jî ji hev cuda be. Metinên vegêranê yên ku di pirtûkên dersên ziman da cih digrin ji ber ku ji metinên agahîder bêtir xitabî rastîyên subjektîf ên zarokan dikin bêtir bala zarokan dikşînin. Ji ber vê xalê li gor rastîya zarokan amadekirina metinên vegêranê yên ku di pirtûkên dersan da cih digrin ji bo perwerdeya zarokan pir giring e.

Di metinên vegêranê yên di pirtûkên kurmancî da lihevhatinek li rastîya zarokan hebû tunebû nedihat zanîn loma li lîteraturê hat nerîn. Gava li lîteraturê hatîye nerîn hat dîtin ku li ser metinên pirtûka kurmancî xebatên li ser mijarên cuda hene (Gökhan û Bulut, 2024; Kurt, 2024). Lê belê hat dîtin ku derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê li rastîya zarokan tu xebat nehatîye kirin. Ev kêmasîya di lîteraturê da hebû, bûye sedem ku ev vekolîn bê amadekirin. Bi vê vekolînê wê rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî da li rastîya zarokan bê nîşandan û bi vî hawî wê ev kemasîya di lîteraturê da heye bê dagirtin.

## 5. Armanca Vekolînê

Armanca vê vekolînê, metinên vegêranên yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an ji alîyê rastîya zarokan ve vekolandin e. Ji bo gihîştina vê armanca sereke, hewl hatîye dayîn ku ev armancên jêrîn werin bidestxistin:

1- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê li xwezaya zarokan,

2- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê li pêdiviyên zarokan,

3- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê yên li bergeha zarokan,

4- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê yên li hewesên zarokan,

5- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê yên li gerdûna ziman û fehma zarokan,

6- Vekolandina lihevhatina metinên vegêranê yên li rastîya zarokan.

Li gor van armancan 14 metinên vegêranê yên vê pirtûkê li gor *xweza, pêdivî, bergeh, hewes* û *gerdûna ziman û fehma zarokan* ve hatîye nirxandin. Destkeftîyên ku hatine bidestxistin li gor jêr-armancên vekolînê bi tabloyan ve hatine pêşkêşkirin. Li gor van armancan rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an û hêmanên rastîya zarokan bi awayekî zanistî û bi daneyên jimarî ve hatîye pêşkêşkirin.

## Rêbaz

### 1. Modela Vekolînê

Ev vekolîn li gor yek ji modelên *rêbaza vekolîna çawanî (qualitative research methods)* ya bi navê *analîza dokumentan (document analysis)* ve hatîye çêkirin. Rêbazên çawanîyê ji bo xebitîna li ser mijarên kûr û fireh rê li ber mirovan vedike û îmkana îzahata kûrbûn û firehbûna mijarên vekolînê dide mirovan (Patton, 2014). Analîza dokumentê, analîza materyalan e ku dîyarde an jî dîyardeyên ku tên vekolandin di xwe da dihewîne (Yıldırım & Şimşek, 2021). Analîza dokumentê ji qeyd û dokumentên di derheqê xebata ku wê bê kirin berhev dike û li gor norm an jî sîstemeke eşkere kod dike û vedikole (Çepni, 2012). Analîza dokumentê bi navên 'çavdêrîya belgeyî' an jî 'venêrîna belgeyî' jî tên binavkirin (Çepni, 2012). Venêrîna belgeyî ji bo armanceke dîyar ji peydakirin, xwendin, nîşegirtin û nirxandina çavkanîyan pêk tê (Karasar, 2012). Di vê pêvajoyê da xala herî giring ev e ku agahîyên di çavkanîyan da hatine vegotin li gor famkirina vekoler hatîye vegotin. Bi vê rêbazê tiştên ku hatine kirin, têgihiştinên giştî û ramanên cuda bêtir dîyar dibin (Çepni, 2012).

Di vê vekolînê da metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da li gor lihevhatina wan ya li rastîya zarokan ve hatîye vekolandin. Di vekolînê da daneyên ku hatine bidestxistin bi destkeftîyan hatîye pêşkêşkirin, paşê hatîyê nirxandin û nîqaşkirin.

## 2. Materyala Vekolînê

Materyala vê vekolînê ji 14 metinên vegêranêne yên di pirtûka dersa *Kurdî Kurmacî 5* da cih digire pêk tê. Ew pirtûk ji alîyê komîsyoneke nivîskaran ve hatîye amadekirin û ji alîyê Wezareta Perwerdeya Neteweyî ve di salên 2022-2023 da hatîye weşandin. Pirtûk ji 9 unîteyan pêk tê. Navên unîte,  metin û cureyên metinan yên ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an  da cih girtine di tabloya jêrê da hatine nîşandan.

**Tablo 1.** *Belavbûna metinên vegêranê yên ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an a weşanên Wezareta Perwerdeya Neteweyî da cih girtine*


| Hejmara rêzikan | Unîte | Navên metinên vegêranê | Cureyên metinan |
|---|---|---|---|
| 1 | Em Zimanê Xwe Nas Bikin | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | Pêkenok |
| | | Fermo Tu Bixwîne | Pêkenok |
| 2 | Ez û Malbata Xwe | Camêr Camêran Nas Dikin | Pêkenok |
| | | Şengê û Pengê | çîrok |
| 3 | Xwendingeh û Jîngeha Min | Lênûska Vala | Pêkenok |
| 4 | Laş û Tenduristî | Tenduristî | Çîrok |
| | | Her Derê Min Diêşe | Pêkenok |
| 5 | Xurek û Vexurekên Me | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | Pêkenok |
| 6 | Salname û Demsal | | |
| 7 | Geştûger û Hatûçû | Rêwî | Pêkenok |
| 8 | Lîstik û Çîrok | Mihrîcana Lîstikan | Çîrok |
| | | Çîroka Apê Min | Çîrok |
| | | Wêneyên Wêsîqeyî | Pêkenok |
| 9 | Çalakîyên Serbest | Hobîyên Me | Çîrok |
| | | Heft Roj | Pêkenok |

## 3. Komkirina Daneyan

Daneyên vê vekolînê bi teknîka *analîza dokumentan* ve hatine berhevkirin. Analîza dokumentê, ji bo berhevkirina daneyan, yek ji rêbazên *vekolîna çawan*îye. Ji bo danîna bingeha teorik a vê vekolînê li lîteratûrê hatîye nerîn. Xebatên zanistî yên di vê qadê da hatine kirin, bi berfirehî hatine vekolandin. Pişt ra di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da metinên vegêranê hatine tespît kirin. Di encamê da, 14 metinên vegêranê yên ku hatine tespît kirin ji aliyê vêkolerî ve çend caran bi awayekî hûrgilî hatine xwendin. Pişt ra îfade, hevok, paragrafên ku rasterast an jî nerasterast eleqeya wan bi hêmanên rastîya zarokan (xwezaya zarokan, pêdivîyên zarokan, bergeha zarokan, hewesên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan) ve hene hatine tespîtkirin û nîşandan. Bi vî hawî di kîjan metinan da hêmanên rastîya zarokan hebe hatîye qeydkirin. Di dawîyê da jî hêmanên rastîya zarokan yên ku di metinan da derbas dibin li gor jêr-hêmanan ve hatine kategorîzekirin û bi tabloyan ve hatine pêşkêşkirin.

## 4. Amûra Komkirina Daneyan

Di vê vekolînê da ji bo dîyarkirina hêmanên girêdayî rastîya zarokan ewilî ji serenavên *xwezaya zarokan, pêdivîyên zarokan, bergeha zarokan, hewesên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan* ên ku Çer (2014) danîye li ber çavan hatîye girtin. Di vê vekolînê da li gel vê xebatê ji jêr-hêmanên wan sernavan ên ku ji alîyê Sahilli (2022) hatîye amadekirin jî sûd hatîye wergirtin. Ji xeynî van xebatan ji bo serenav û hêmanên girêdayî rastîya zarokan ji xebata Yücel (2024) sûda hatîye wergirtin. Lewra di vê xebatê da tabloya hêmanên rastîya zarokan li gor temen û geşedana xwendekarên pola 5an hatiye amadekirin. Metinên vegêranê yên ku di pirtûka pola 5an a kurmancî da cih girtine li gor tabloya jêrîn a *hêman û jêr-hêmanên rastîya zarokan* ve hatine vekolandin.




Şikil 1. *Hêmanên girêdayî rastîya zarokan.*

### 5. Analîza Daneyan

Di vê vekolînê da dane bi rêya *analîza teswîrî (destcriptive analysis) ve* ku ew yek ji teknîkên rêbaza vekolîna çawanî ye, hatine analîzkirin. Di analîza teswîrî da daneyên ku hatine bidestxistin li gor çarçoveya temayên dîyarkirî ve di nav têkilîya sedem û encamê da tên şîrovekirin, kurtkirin û piştra tên sererastkirin û ji bo xwendevanan tên pêşkêşkirin (Yıldırım & Şimşek, 2021).

Di vê vekolînê da têmayên vekolînê ji hêmanên girêdayî rastîya zarokan (xwezaya zarokan, pêdivîyên zarokan, hewesên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan) ve pêk tê. Metinên vegêranê yên pirtûka pola 5an a kurmancî li gor hêmanên rastîya zarokan ve hatine nirxandin û analîzkirin. Di vê vekolînê da her metinê vegêranê yên pirtûka dersê yek bi yek li gor hêman û jêr-hêmanên rastîya zarokan ve hatîye nirxandin. Paşê rêjeya lihevhatina metinan û hêmanên rastîya zarokan bi alîkarîya daneyên jimarî ve hatine îfadekirin, bi tabloyan ve hatine pêşkêşkirin û şîrovekirin.

Di vê vekolînê da her metineke vegêranê li gor hebûna yek ji hêman an jêr-hêmanek rastîya zarokan ve hatîye nirxandin. Ji bor her metinekî ger hêmanek an jêr-hêmanek di metinekê da hebe ew metin li gor wê jêr-hêmana rastîya zarokan hatîye qebûlkirin. Di tabloyên jêr-armancên vekolînê da eger metin li gor wê jêr-armancê be bi sembola “+” ve hatîye nîşandan eger ne li gor wê be bi sembola “-“ ve hatîye nîşandan. Ji bo jêr-hêmanên gerdûna ziman û fehma zarokan li gor xebatên lîteraturê krîter hatine dîyar kirin. Di nirxandina metinan da ji bo serenava “gerdûna peyvan” a ku sê heb an jî ji sêyan zêdetir biwêj, zûgotinok, an jî gotinên pêşîyan hebe ew li gor gerdûna peyvan hatîye qebûlkirin û li gor wê di tabloyê da hatine nîşandan. Di nirxandina metinan da ji bo serenava “gencîneya peyvan” ku sê heb an jî ji sêyan zêdetir peyvên ku gencîneya peyvên zarokan zêde bike hebe ew li gor gencîneya peyvan hatîye qebûlkirin û li gor wê jî di tabloyê da hatine nîşandan.

### 6. Derbasdarî û Pêbawerî

Di analîza daneyên çawanîyê da vekolîner ji bo erêkirina derbasdarîya xebata xwe lazim e çawa daneyên xwe kom kirine û analîz kirine îzah bikin (Yıldırım&Şimşek, 2021). Li gor Cansız Aktaş (2014) di vekolîna dokumentan da ji bo bidestxistina *derbasdarî û pêbawerîyê (validity and reliability),* pêbawerbûna daneyan roleka giring dilîze, ji ber vê divê dane bi awayekî zelal û hevgirtî bên pêşkêşkirin û bi vekolerekî din ra bên erêkirin. Ji bo dabînkirina derbasdarî û pêbawerîya vê xebatê li lîteraturê hatîye nerîn xebatên derheqê mijara gotarê da hatine vekolandin.

Ji bo dabînkirina vê vekolînê li lihevkirina kodkaran hatîye nerîn. Bi vê armancê çend metinên vegêranê piştî vekoler ji alîyê du kodkarên beşa tirkî yek jê pisporek beşa mamostetîya tirkî yek jî akademîyenek beşa mamostetîya tirkî ve hatine nirxandin. Paşê li lihevhatina navbera kodkaran hatîye nerîn. Ji bo vê formula ku Miles û Huberman (2015) pêşnîyaz kirîye ya ku wekî ‘Pêbawerî = Yekîtîya nerînê / (Yekîtîya nerînê + Cudabûna nerînê) x 100’ tê formulîzekirin hatîye bikaranîn. Li gor vê lihevhatina navbera kodkaran ji %70 zêdetir (%83) derketîye holê. Ev xal jî pêbawerîya kodkirinên vê xebatê nîşan dide. Paşê vekoler metinên ku mayî dîsa li gor vê çarçoveyê li kodkirina xwe dewam kirîye.

Ji bo derbasdarîya vê vekolînê agahîyên derheqê hemû merheleyên pêvajoya vekolînê bi awayekî berfireh hatîye dayîn. Di her merheleya vekolînê da serî li fikr û nêrîna pisporî hatîye dayîn. Dema ku materyala xebatê hate tespîtkirin û dane hatine berhevkirin gava ku pêwîst bû vekoler pisporekî din ê vê qadê şêwirîye. Dema ku pêwist bû nêrinên hin vekolerên din ên ku pisporên qadê ne û nêrînên hin pisporên qadên cuda jî hatine stendin.

## Destkeftî û Şîrove

### 1. Destkeftîyên Derbarê Jêr-Armanca Yekem

Yekem jêr-armanca vê vekolînê, di derheqê rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an a weşanên Wezareta Perwerdeya Neteweyî li xwezaya zarokan e. Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê bi xwezaya zarokan ra li tabloya jêrê hatîye nîşandan.

**Tablo 2.** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li xwezaya zarokan*

| Hejmara rêzikan | Navên metinan | Jêr-hêmanên girêdayî xwezaya zarokan | | | | | Rêjeya lihevhatina metinan li xwezaya zarokan (%) |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | Meraq | Şîyana xeyalkirinê | Kelecanî | Tevgerdarî | Jidilbûn | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | + | - | - | - | + | 40 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | - | - | - | - | + | 20 |
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | + | - | - | - | + | 40 |
| 4 | Şengê û Pengê | + | + | + | + | + | 100 |
| 5 | Lênûska Vala | + | - | - | - | + | 40 |
| 6 | Tenduristî | + | - | - | + | + | 60 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | + | - | - | + | + | 60 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | + | - | - | - | + | 40 |
| 9 | Rêwî | + | - | - | + | + | 60 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | - | - | - | + | - | 20 |
| 11 | Çîroka Apê Min | + | + | - | + | + | 80 |
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | + | - | - | + | + | 60 |
| 13 | Hobîyên Me | + | - | + | + | + | 80 |
| 14 | Heft Roj | - | - | - | - | + | 20 |
| **Serhev** | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî xwezaya zarokan li nav xwe dihewînin** | **11 (79)** | **2 (14)** | **2 (14)** | **8 (57)** | **13 (93)** | Rêjeya lihevhatina metinan li xwezaya zarokan: **%51** |
| | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî xwezaya zarokan li nav xwe nahewînin** | **3 (21)** | **12 (86)** | **10 (86)** | **6 (43)** | **1 (7)** | |

Wekî ku di tabloya 2. da jî hatîye nîşandan di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da bi tevahî 14 metinên vegêranê hene. Dema ku ev metin di bin jêr-hêmanên girêdayî xwezaya zarokan da (meraq, şîyana xeyalkirinê, kelecanî, tevgerdarî, jidilbûn) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku metina bi navê “Şengê û Pengê” hemû jêr-hêmanên girêdayî xwezaya zarokan di naverokên xwe da dihewînin, metinên bi navê “Fermo Tu Bixwîne, Mihrîcana Lîstikan, Heft Roj” jî li gor metinên din di naveroka xwe da herî kêm jêr-hêmanên xwezaya zarokan vedihewînin. Dema li metinan tê dinêrin, tê dîtin ku metinên bi navê “Çîroka Apê Min û Hobîyên Me” ji pênc jêr-hêmanan çar heban, metinên bi navê “Tenduristî, Her Derê Min Diêşe, Rêwî, Wêneyên Wesîqayî” jî ji pênc jêr-hêmanan sê heban, metinên bi navê “Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê, Camêr Camêran Nas Dikin, Lênûska Vala, Te Tiştek Ji Min ra Nehişt” jî ji pênc jêr-hêmanan du heban vedihewînin

Dema ku rêza dawî ya tabloyê hat analîzkirin, hat dîtin ku 11 (%79) ji metinên vegêranê yên di pirtûkê da jêr-hêmana meraqê dihewîne, 3 (%21) nahewîne; 2 (%14) jêr-hêmana şîyana xeyalkirinê dihewîne, 12 (%86) nahewîne; 2 (%14) jêr-hêmana kelecanê dihewîne, 12 (%86) nahewîne; 8 (%57) jêr-hêmana tevgerdarîyê dihewîne, 6 (%43) nahewîne; 13 (%93) metin jêr-hêmana jidilbûnê dihewîne, 1 (%7) nahewîne. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûkê bi jêr-hêmanên girêdayî xwezaya zarokê ra %51 e. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên pirtûkê xwedî rêjeyeke navîn a lihevhatina

xwezaya zarokan e.

Li jêrê ji pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an du mînak hatîye dayîn:

*“Gelo ew kî ne?”* (Ji metina Camêr Camêran Nas Dikin; ji bo jêr-hêmana *meraq*)

*“Roja yekşemê ji kêfan ez zû şîyar bûm. Êdî min hew karîbû razim.”* (Ji metina Hobîyên Me; ji bo jêr-hêmana *kelecanî*)

## 2. Destkeftîyên di Derbareyê Jêr-Armanca Duyem da

Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an bi pêdiviyên zarokan ra di tabloya jêrîn da hatîye nişandan.

**Tablo 3.** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li pêdiviyên zarokan*

| Hejmara rêzikan | Navên metinan | Jêr-hêmanên girêdayî pêdiviyên zarokan | | | | | | | | | Rêjeya lihevhatina metinan li pêdivîyên zarokan (%) |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | Hezkirin | Bawerî | Jiyîn, tecribe û kişfkirin | Xwedî qedirbûn | Diltenikî | Berberpisyarî | Huner û afirînerî | Hevkarî / bi komekê ve girêdayîbûn | Xweserî | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | - | - | - | - | - | - | - | - | - | 0 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | - | - | - | - | - | - | - | - | - | 0 |
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | + | + | - | + | - | - | - | - | - | 33 |
| 4 | Şengê û Pengê | + | + | + | + | - | - | - | + | - | 56 |
| 5 | Lênûska Vala | - | - | - | - | - | - | - | - | - | 0 |
| 6 | Tenduristî | - | - | + | + | + | + | - | - | - | 44 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | - | - | + | - | - | - | - | - | - | 11 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | + | - | - | - | - | - | - | - | - | 11 |
| 9 | Rêwî | - | - | - | + | - | + | - | + | - | 33 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | - | - | + | + | - | + | + | + | - | 56 |
| 11 | Çîroka Apê Min | - | + | + | - | + | + | - | - | + | 56 |
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | - | + | - | + | - | + | - | - | + | 44 |
| 13 | Hobîyên Me | + | - | - | + | - | - | - | + | - | 33 |
| 14 | Heft Roj | - | - | - | - | - | - | + | - | - | 11 |

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Serhev** | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî pêdiviyên zarokan li nav xwe dihewînin** | 4 (29) | 4 (29) | 5 (36) | 7 (50) | 2 (14) | 5 (36) | 2 (14) | 4 (29) | 2 (14) | Rêjeya lihevhatina metinan li pêdiviyên zarokan: **%28** |
| | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî pêdiviyên zarokan li nav xwe nahewînin** | 10 (86) | 10 (86) | 9 (64) | 7 (50) | 12 (86) | 9 (64) | 12 (86) | 10 (71) | 12 (86) | |

Dema ku ev metin di bin jêr-hêmanên girêdayî pêdivîyên zarokan da (hezkirin, bawerî, jiyîn, tecribe û kifşkirin, xwedî qedirbûn, diltenikî, berpisyarî, huner û afirînerî, hevkarî / bi komekê ve girêdayîbûn, xweserî) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê belê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku metinên bi navê "Şengê û Pengê, Mihrîcana Lîstikan, Çîroka Apê Min" herî zêde jêr-hêmanên girêdayî pêdivîyên zarokan di naverokên xwe da dihewîne, metinên bi navê "Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê, Fermo Tu Bixwîne, Lênûska Vala" jî di naveroka xwe da tu jêr-hêmanên pêdivîyên zarokan venahewînin. Dema ku li metinên din tê nerin, tê dîtin ku metinên bi navê " Tenduristî, Wêneyên Wesîqayî" ji neh jêr-hêmanan çar heban; metinên bi navê "Camêr Camêran Nas Dikin, Rêwî, Hobîyên Me" ji neh jêr-hêmanan sê heban; metinên bi navê " Her Derê Min Diêşe, Te Tiştek Ji Min ra Nehişt, Heft Roj" jî ji neh jêr-hêmanan yekê vedihewînin.

Dema ku rêza dawî ya tabloyê hat analîzkirin, hat dîtin ku 4 (%29) ji metinên vegêranê yên di pirtûkê da jêr-hêmana hezkirin dihewîne, 10 (%71) nahewîne; 4 (%29) jêr-hêmana bawerî dihewîne, 10 (%71) nahewîne; 5 (%36) jêr-hêmana jiyîn, tecribe û kifşkirin dihewîne, 9 (%64) nahewîne; 7 (%50) jêr-hêmana xwedî qedirbûn dihewîne, 7 (%50) nahewîne; 2 (%14) jêr-hêmana diltenikî dihewîne, 12 (%86) nahewîne; 5 (%36) jêr-hêmana berpisyarî dihewîne, 9 (%64) nahewîne; 2 (%14) jêr-hêmana huner û afirînerî dihewîne, 12 (%86) nahewîne; 4 (%29) jêr-hêmana hevkarî / bi komekê ve girêdayîbûn dihewîne, 10 (%71) nahewîne û 2 (%14) jêr-hêmana xweserî dihewîne, 12 (%86) nahewîne. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûkê bi hêmanên girêdayî pêdivîyên zarokan ra %28 e. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên pirtûkê xwedî rêjeyeke kêm a lihevhatina pêdivîyên zarokan e.

Li jêrê ji pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an du mînak hatîye dayîn:

*"Şengê û Pengê diçin hembêza dêya xwe. Bizin wan maçî dike û bi hev ra diçin mala xwe."* (Ji Metina Şengê û Pengê; ji bo jêr-hêmana *hezkirin*)

*"Herwiha ji bo tenduristîya xwe divê em çopên xwe neavêjin erdê û derdora xwe paqij bihêlin."* (Ji metina Tenduristî; ji bo jêr-hêmana *diltenikî*)

### 3. Destkeftîyên di Derbareyê Jêr-Armanca Sêyem da

Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an bi bergeha zarokan ra di tabloya jêrîn da hatîye nişandan.

**Tablo 4.** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li bergeha zarokan*

| **Hejmara rêzikan** | **Navên metinan** | **Jêr-hêmanên girêdayî bergeha zarokan** | | **Rêjeya lihevhatina metinan li bergeha zarokan (%)** |
|---|---|---|---|---|
| | | **Lehenga zarok** | **Nêrîna zarokan** | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | + | + | 100 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | - | - | 0 |
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | + | + | 100 |
| 4 | Şengê û Pengê | + | + | 100 |
| 5 | Lênûska Vala | + | + | 100 |
| 6 | Tenduristî | + | + | 100 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | - | + | 50 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | - | + | 50 |
| 9 | Rêwî | - | - | 0 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | + | + | 100 |
| 11 | Çîroka Apê Min | + | + | 100 |
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | - | + | 50 |
| 13 | Hobîyên Me | + | + | 100 |
| 14 | Heft Roj | + | + | 100 |
| **Serhev** | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî bergeha zarokan li nav xwe dihewînin** | **10 (71)** | **12 (86)** | Rêjeya lihevhatina metinan li bergeha zarokan: **%75** |
| | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî bergeha zarokan li nav xwe nahewînin** | **4 (29)** | **2 (14)** | |

Dema ku ev metin di bin jêr-hêmanên girêdayî bergeha zarokan (lehega zarok û nerîna zarokan) da hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku metinên bi navê “Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê, Camêr Camêran Nas Dikin, Şengê û Pengê, Lênûska Vala, Tenduristî, Mihrîcana Lîstikan, Çîroka Apê Min, Hobîyên Me, Heft Roj” bi hemû jêr-hêmanên girêdayî bergeha zarokan di naverokên xwe da vedihewînin, metinên bi navê “Her Derê Min Diêşe, Te Tiştek Ji Min ra Nehişt, Wêneyên Wesîqeyî” li gor metinên din di naveroka xwe da du jêr-hêmanên bergeha zarokan vedihewînin, metinên bi navê “Fermo Tu Bixwîne, Rêwî” jî li gor metinên din di naveroka xwe da tu jêr-hêmanên bergeha zarokan venahewîne.

Dema ku rêza dawî ya tabloyê hat analîzkirin, hat dîtin ku 10 (%71) ji metinên vegêranê yên di pirtûkê da jêr-hêmana lehega zarok dihewîne, 4 (%29) nahewîne; 12 (%86) jêr-hêmana nerîna zarokan dihewîne, 2 (%14) nahewîne. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûkê li hêmanên girêdayî bergeha zarokan ra %75 e. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên pirtûkê xwedî rêjeyeke zêde ya lihevhatina bergeha zarokan e.

Li jêrê ji pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an du mînak hatîye dayîn:

*"Emer duwazdeh salî ye û Rênas bi salekê ji Emer piçûktir e."* (Ji metina Camêr Camêran Nas Dikin; ji bo jêr-hêmana *lehenga zarok*)

*"Dema mamosteyê me tiştên ku li dep nivîsandine jê dibe ez jî ji deftera xwe dibim."* (Ji metina Lênûska Vala; ji bo jêr-hêmana *nerîna zarokan*)

## 4. Destkeftîyên di Derbareyê Jêr-Armanca Çarem da

Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an bi hewesên zarokan ra di tabloya jêrîn da hatîye nişandan.

**Tablo 5an** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li hewesên zarokan*

| Hejmara rêzikan | Navên metinan | Jêr-hêmanên girêdayî hewesên zarokan | | | | Rêjeya lihevhatina metinan li hewesên zarokan (%) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | Meraq û serpêhatî | Werzîş | Tarîx, qehremanî | Xweza, fen/zanist | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | - | - | - | - | 0 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | - | - | - | - | 0 |
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | - | - | - | + | 25 |
| 4 | Şengê û Pengê | + | - | + | + | 75 |
| 5 | Lênûska Vala | - | - | - | - | 0 |
| 6 | Tenduristî | - | - | - | + | 25 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | - | - | - | - | 0 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | - | - | - | - | 0 |
| 9 | Rêwî | - | - | - | - | 0 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | + | + | - | - | 50 |
| 11 | Çîroka Apê Min | + | - | - | + | 50 |
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | - | - | - | - | 0 |
| 13 | Hobîyên Me | - | - | - | - | 0 |
| 14 | Heft Roj | - | - | - | - | 0 |
| Serhev | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî hewesên zarokan li nav xwe dihewînin** | **3 (21)** | **1 (7)** | **1 (7)** | **4 (29)** | Rêjeya lihevhatina metinan li hewesên zarokan: **%16** |
| | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî hewesên zarokan li nav xwe nahewînin** | **11 (79)** | **13 (93)** | **13 (93)** | **10 (71)** | |

Dema ku ev metin di bin jêr-hêmanên girêdayî hewesên zarokan da (meraq û serpêhatî, werzîş, tarîx, qehremanî, xweza û fen/zanist) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê belê di hin metinan da ev rêje pir kêm e. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku metineke ku hemû jêr-hêmanên girêdayî hewesên zarokan di naverokên xwe da dihewîne tune ye. Metina bi navê "Şengê û Pengê" herî zêde jêr-hêmanên girêdayî hewesên zarokan di naverokên xwe da dihewîne, metinên bi navê "Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê, Fermo Tu Bixwîne, Lênûska Vala, Her Derê Min Diêşe, Te Tiştek Ji Min ra Nehişt, Rêwî, Wêneyên Wêsîqeyî, Hobîyên Me, Heft Roj" jî di naveroka xwe da tu jêr-hêmanên hewesên zarokan venahewînin. Dema ku li metinên din tê nerîn, tê dîtin ku metinên bi navê "Mihrî-

cana Lîstikan, Çîroka Apê Min” ji çar jêr-hêmanan du heban; metinên bi navê “Tenduristî” ji çar jêr-hêmanan yekê vedihewînin.

Dema ku rêza dawî ya tabloyê hat analîzkirin, hat dîtin ku 3 (%21) ji metinên vegêranê yên di pirtûkê da jêr-hêmana meraq û serpêhatîyê dihewîne, 11 (%79) nahewîne; 1 (%7) jêr-hêmana werzîşê dihewîne, 13 (%93) nahewîne; 1 (%7) jêr-hêmana tarîx, qehremanî dihewîne, 13 (%93) nahewîne; 4 (%29) jêr-hêmana Xweza û Fen/Zanistê dihewîne, 10 (%71) nahewîne. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûkê bi hêmanên girêdayî hewesên zarokan ra %16 ye. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên pirtûkê xwedî rêjeyeke pir kêm a lihevhatina hewesên zarokan e.

Li jêrê ji pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an du mînak hatîye dayîn:

*“Bizin bi ser dikeve. Dawî bizin diçe Şengê û Pengê ji destê gur rizgar dike.”* (Ji metina Şengê û Pengê; ji bo jêr-hêmana *tarîx, qehremanî*)

*“Bi hev ra dimeşin heta ku digihêjin ser girekî û li ser kevirekî pan rûdinin. Li wir li kar û xebatên gundîyan temaşe dikin.”* (Ji metina Camêr Camêran Nas Dikin; ji bo jêr-hêmana *xweza û fen/zanist*)

**5. Destkeftîyên di Derbareyê Jêr-Armanca Pêncem da**

Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an bi gerdûna ziman û fehma zarokan ra di tabloya jêrîn da hatîye nîşandan.

**Tablo 6.** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li gerdûna ziman û fehma zarokan*

| Hejmara rêzikan | Navên metinan | Jêr-hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan | | | | Rêjeya lihevhatina metinan li gerdûna ziman û fehma zarokan (%) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | Zimanekî sade | Gerdûna peyvan | Gencîneya peyvan | Li Gor Gerdûna zarokan Vegotin | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | + | - | - | + | 50 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | + | - | + | + | 75 |
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | + | - | - | + | 50 |
| 4 | Şengê û Pengê | + | + | + | + | 100 |
| 5 | Lênûska Vala | + | - | - | + | 50 |
| 6 | Tenduristî | + | - | + | + | 75 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | + | - | - | + | 50 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | + | - | - | + | 50 |
| 9 | Rêwî | + | - | - | + | 50 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | + | - | + | + | 75 |
| 11 | Çîroka Apê Min | + | + | + | + | 100 |

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | + | - | + | + | 75 |
| 13 | Hobîyên Me | + | - | + | + | 75 |
| 14 | Heft Roj | + | - | - | + | 50 |
| **Serhev** | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan li nav xwe dihewînin** | **14 (100)** | **2 (14)** | **7 (50)** | **14 (100)** | Rêjeya lihevhatina metinan li gerdûna ziman û fehma zarokan: **%70** |
| | **Hejmar û rêjeya metinên ku hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan li nav xwe nahewînin** | **0 (0)** | **12 (86)** | **7 (50)** | **0 (0)** | |

Dema ku ev metin di bin jêr-hêmanên gerdûna ziman û fehma zarokan da (zimanekî sade, gerdûna peyvan, gencîneya peyvan, li gor gerdûna zarokan vegotin) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku metinên bi navê “Şengê û Pengê, Çîroka Apê Min” hemû jêr-hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan di naverokên xwe da dihewînin. Dema ku li metinên din tê nerîn, tê dîtin ku metinên bi navê ”Fermo Tu Bixwîne, Tenduristî, Mihrîcana Lîstikan, Wêneyên Wêsîqeyî, Hobîyên Me” ji çar jêr-hêmanan sê heban; metinên bi navê “Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tên, Camêr Camêran Nas Dikin, Lênûska Vala, Her Derê Min Diêşe, Te Tiştek Ji Min ra Nehişt, Rêwî, Heft Roj” ji çar jêr-hêmanan du heban vedihewînin.

Dema ku rêza dawî ya tabloyê hat analîzkirin, hat dîtin ku 14 (%100) ji metinên vegêranê yên pirtûkê jêr-hêmana zimanekî sade dihewîne, 0 (%0) nahewîne; 2 (%14) jêr-hêmana gerdûna peyvan dihewîne, 12 (%86) nahewîne; 7 (%50) jêr-hêmana gencîneya peyvan, dihewîne, 7 (%50) nahewîne; 14 (%100) jêr-hêmana li gor gerdûna zarokan vegotinê dihewîne, 0 (%0) nahewîne. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûkê bi hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan ra %80 ye. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên pirtûkê xwedî rêjeyeke zêde ya lihevhatina gerdûna ziman û fehma zarokan e.

Li jêrê ji pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an du mînak hatîye dayîn:

*“Lezgîn, tu hemû tîpên alfabeyê dizanî?”* (Ji metina Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê; ji bo jêr-hêmana *zimanekî sade*)

*“Tiştê ez dizanim wêneyê wesîqeyî, ew wêne ye ku tê da nîvê bejina mirov xuya ye. Tu çalekê li vir bikole ez dê herim wênegirê bînim û wêneyên te bigirim.”* (Ji metina Wêneyên Wesîqeyî; ji bo jêr-hêmana *li gor gerdûna zarokan vegotin*)

## 6. Destkeftîyên di Derbareyê Jêr-Armanca Şeşem da

Agahîyên derheq rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li rastîya zarokan di tabloya jêrîn da hatîye nişandan.

**Tablo 7.** *Rewşa lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an li rastîya zarokan*

| **Hejmara rêzikan** | **Navên metinan** | **Hêmanên girêdayî rastîya zarokan** | | | | | **Rêjeya lihevhatina metinan li rastîya zarokan (%)** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | **Xwezaya zarokan** | **Pêdiviyên zarokan** | **Bergeha zarokan** | **Hewesên zarokan** | **Gerdûna ziman û fehma zarokan** | |
| 1 | Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê | 40 | 0 | 100 | 0 | 50 | 38 |
| 2 | Fermo Tu Bixwîne | 20 | 0 | 0 | 0 | 75 | 19 |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | Camêr Camêran Nas Dikin | 40 | 33 | 100 | 25 | 50 | 49 |
| 4 | Şengê û Pengê | 100 | 56 | 100 | 75 | 100 | 86 |
| 5 | Lênûska Vala | 40 | 0 | 100 | 0 | 50 | 38 |
| 6 | Tenduristî | 60 | 44 | 100 | 25 | 75 | 60 |
| 7 | Her Derê Min Diêşe | 60 | 11 | 50 | 0 | 50 | 34 |
| 8 | Te Tiştek Ji Min ra Nehişt | 40 | 11 | 50 | 0 | 50 | 30 |
| 9 | Rêwî | 60 | 33 | 0 | 0 | 50 | 28 |
| 10 | Mihrîcana Lîstikan | 20 | 56 | 100 | 50 | 75 | 60 |
| 11 | Çîroka Apê Min | 80 | 56 | 100 | 50 | 100 | 77 |
| 12 | Wêneyên Wêsîqeyî | 60 | 44 | 50 | 0 | 75 | 45 |
| 13 | Hobîyên Me | 80 | 33 | 100 | 0 | 75 | 57 |
| 14 | Heft Roj | 20 | 11 | 100 | 0 | 50 | 32 |
| | **Serhev** | **51** | **28** | **75** | **16** | **70** | **47** |
| **Rêjeya lihevhatina kitêbê li rastîya zarokan: %47** | | | | | | | |

Di tabloya 7an da agahîyên derheq rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yê pola 5an a pirtûka dersa kurmancî li rastîya zarokan cih girtîye. Dema ku ev metinana di bin hêmanên rastîya zarokan da (xwezaya zarokan, pêdivîyên zarokan, bergeha zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Metineke ku sedî sed li hêmanên rastîya zaroka tê yan jî qet li hêmanên rastîya zarokan nayê tune ye.

Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku di metina bi navê "Şengê û Pengê (%86)" da rêjeyeke pir zêde ya lihevhatina hêmanên rastîya zarokan heye; di metinên bi navê "Tenduristî (%60), Mihrîcana Lîstikan (%60), Çîroka Apê Min (%77)"da rêjeyeke zêde ya lihevhatina hêmanên rastîya zarokan heye; di metinên bi navê "Camêr Camêran Nas Dikin (%49), Wêneyên Wesîqeyî (%45), Hobîyên Me (%57)" da rêjeyeke navîn a lihevhatina hêmanên rastîya zarokan heye û di metinên bi navê "Li Pey Ayê Kîjan Tîp Tê (%38), Her Derê Min Diêşe (%34), Te Tiştek Ji Min ra Nehişt (%30) Lênûska Vala (%38), Rêwî (%28), Heft Roj (%32)" da rêjeyeke kêm a lihevhatina hêmanên rastîya zarokan heye; di metina bi navê "Fermo Tu Bixwîne (%19)" da rêjeyeke pir kêm a lihevhatina hêmanên rastîya zarokan heye. Li gor van agahîyan di nav metinên vegêranê yên pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da metina ku bi rêjeya herî zêde (%86) li rastîya zarokan hatîye "Şengê û Pengê" ye, metina ku bi rêjeya herî kêm (%19) li rastîya zarokan hatîye metina "Fermo Tu Bixwîne (%19)" e. Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da li hêmanên rastîya zarokan zarokan ji %47 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûkê da xwedî rêjeyeke navîn a lihevhatina rastîya zarokan e.

## Encam, Nîqaş û Pêşnîyaz

Pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an ya ku li xwendingehan tê xwendin ji bo hînbûna ziman, çand û edebîyata kurmancî çavkanîyeke sereke ye. Metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da cih digrin hem ji bo zarok gerdûna zimanê xwe fireh bikin û hêm jî ji bo gerdûna ku tê da dijîn nas bikin mihîm e. Zarok di vî temenê xwe da ji ber ku ne xwedîyê agahîyên objektîf in ji bo famkirina gerdûnê di hişê xwe da li gor zanabûna xwe gerdûnekê ji rastîyên xwe yên subjektîf diafirînin. Ji ber vê jî zarokên pola 5an di çaxên vî temenê xwe da ji metinên agahdarîyê bêtir ji metinên honakî hez dikin. Lewra metinên honakî yan jî edebî xitabî vê rastîya zarokan a subjektîf dike, ji metinên agahîdêr bêtir têsîr li zarokan dike û bi alîkarîya gerdûneke honakî yan edebî gerdûna rasteqîn bi wan dide naskirin. Ji bo xîtabkirina gerdûna zarokan lazim e nivîskarên ku metinên vegêranê amade dikin, hêmanên rastîya zarokan baş bizanibin û çîroka metinên xwe li gor van xalan bihûnin.

Di vê vekolîna ku armanca wê metinên vegêranê yên di pirtûka dersa pola 5an a kurmancî li gor rastîya zarokan vekolandine, metinên ku hatine vekolandin li gor hêmanên rastîya zarokan ên Yücel (2024) *xwezaya*

*zarokan, pêdivîyên zarokan, bergeha zarokan, hewesên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan* yek bi yek hatine vekolandin û rêjeya lihevhatina metinên vegêranê li hêmanên rastîya zarokan bi tabloyan ve hatine nîşandan. Di literatura kurmancî da xebateke bi vî hawî ji bo vê mijarê nehatîye kirin di literatura tirkî da jî tenê xebata Yücel (2024) ya masterê heye. Yücel (2024) di teza xwe ya masterê da metinên vegêranê yên du pirtûkên weşanên Anıttepe û Koza yên dersa tirkî ya pola 5an li gor rastîya zarokan û hêmanên girêdayî wê ve vekolandîye. Di vê vekolînê da ewilî metinên vegêranê yên pola 5an a kurmancî li gor rastîya zarokan hatîye vekolandin û rêjeya wan bi tabloyan ve hatine nîşandan. Pişt ra encamên ku derketîye hatine analîzkirin û şîrovekirin. Encamên giştî yên ku ji vê vekolînê derketîye paşê bi encamên giştî ya mijara teza Yücel (2024) ra hatîye berawirdkirin û nîqaşkirin.

Di vê vekolînê da hêmana ewil a ku li gor lihevhatina hêmanên rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin xwezaya zarokan e. Dema ku metinên vegêranê di bin jêr-hêmanên girêdayî xwezaya zarokan da (meraq, şîyana xeyalkirinê, kelecanî, tevgerdarî, jidilbûn) hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da bi hêmanên girêdayî xwezaya zarokê ra %51 e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe bi hêmanên girêdayî xwezaya zarokê ra %46 e; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da bi jêr-hêmanên xwezaya zarokan ra %43 e. Ev nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê ya pola 5an a kurmancî û Tirkî da xwedî rêjeyên navîn ên lihevhatina xwezaya zarokan in.

Di vê vekolînê da hêmana duyem a ku li gor lihevhatina hêmanên rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin pêdiviyên zarokan e. Dema ku metinên vegêranê di bin hêmanên girêdayî pêdiviyên zarokan da (hezkirin, bawerî, jiyîn, tecribe û kifşkirin, xwedî qedirbûn, diltenikî, berpisyarî huner û afirînerî, hevkarî/bi komekê ve girêdayîbûn, xweserî) hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da bi jêr-hêmanên pêdivîyên zarokan ra %28 e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe li hêmanên girêdayî pêdivîyên zarokan ra %50 e; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da li hêmanên girêdayî pêdivîyên zarokan ra %44 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersê ya pola 5an a kurmancî da xwedî rêjeyeke kêm a lihevhatina pêdivîyên zarokan e lê belê metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê yên pola 5an ên tirkî da xwedî rêjeyên navîn ên lihevhatina pêdivîyên zarokan in.

Di vê vekolînê da hêmana sêyem a ku li gor lihevhatina hêmanên rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin bergeha zarokan e. Dema ku metinên vegêranê di bin hêmanên girêdayî bergeha zarokan da (lehenga zarok, nêrîna zarokan) hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku di hin nivîsan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin nivîsan da ev rêje kêm e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da bi jêr-hêmanên bergeha zarokan ra %75 e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe li hêmanên girêdayî bergeha zarokan ra %55 e; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da li hêmanên girêdayî bergeha zarokan ra %25 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersê ya pola pêncem a kurmancî da xwedî rêjeyeke zêde yên lihevhatina bergeha zarokan in û metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê yên pola 5an ên tirkî ya Anıttepe da xwedî rêjeyeke navîn e lê belê ya Koza xwedî rêjeyeka kêm a lihevhatina bergeha zarokan e.

Di vê vekolînê da hêmana çarem a ku li gor lihevhatina hêmanên rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin hewesên zarokan e. Dema ku ev metin di bin hêmanên girêdayî hewesên zarokan da (meraq û serpêhatî, werzîş, tarîx, qehremanî, xweza û fen/zanist) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da bi jêr-hêmanên hewesên zarokan ra %16 ye. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe li hêmanên girêdayî hewesên zarokan ra %39

e; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da li hêmanên girêdayî hewesên zarokan ra %34 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersê ya pola 5an a kurmancî da xwedî rêjeyeke pir kêm ên lihevhatina hewesên zarokan in û metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê yên pola pêncem ên tirkî ya Anıttepe da xwedî rêjeyeke kêm in û ya Koza jî xwedî rêjeyeka pir kêm a lihevhatina hewesên zarokan in.

Di vê vekolînê da hêmana dawî ya ku li gor lihevhatina hêmanên rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin gerdûna ziman û fehma zarokan e. Dema ku ev metin di bin hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan da (zimanekî sade, gerdûna peyvan, gencîneya peyvan, li gor gerdûna zarokan vegotin) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûkê da bi jêr-hêmanên gerdûna ziman û fehma zarokan ra %70 e. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola pêncem tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe li hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan ra %70 ye; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da li hêmanên girêdayî gerdûna ziman û fehma zarokan ra %79 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersê ya pola 5an a kurmancî da xwedî rêjeyeke zêde yên lihevhatina gerdûna ziman û fehma zarokan in û metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê yên pola 5an ên tirkî ya Anıttepe da xwedî rêjeyeke zêde nin û ya Koza jî xwedî rêjeyeka zêde ya lihevhatina gerdûna ziman û fehma zarokan in.

Di vê vekolînê da piştî hêmanên rastîya zarokan, rêjeya lihevhatina rastîya zarokan û metinên vegêranê hatîye nirxandin. Dema ku ev metinana di bin hêmanên rastîya zarokan da (xwezaya zarokan, pêdivîyên zarokan, bergeha zarokan, hewesên zarokan, gerdûna ziman û fehma zarokan) hatine vekolandin, hat tespîtkirin ku di hin metinan da rêjeya van hêmanan zêde ye, lê di hin metinan da ev rêje kêm e. Metineke ku sedî sed li hêmanên rastîya zaroka tê yan jî qet li hêmanên rastîya zarokan nayê tune ye. Dema ku ev metinana yek bi yek hatine vekolandin, hatîye tespîtkirin ku di nav metinên vegêranê yên pirtûka dersa Kurmancî ya pola 5an da metina ku bi rêjeya herî zêde (%86) li rastîya zarokan hatîye "Şengê û Pengê (%86)" ye, metina ku bi rêjeya herî kêm (%19) li rastîya zarokan hatîye metina "Fermo Tu Bixwîne (%19)" ye.

Dema ku li encama giştî tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûka dersa Kurmancî ya Pola 5an da li hêmanên rastîya zarokan zarokan ji %47 ye. Dema ku li encama giştî ya pirtûka dersa tirkî ya pola 5an tê nerîn, tê dîtin ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Anıttepe li hêmanên girêdayî rastîya zarokan ra %55 e; rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên pirtûka weşanên Koza da li hêmanên girêdayî rastîya zarokan ra %45 e. Ev jî nîşan dide ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersê ya pola 5an a kurmancî da xwedî rêjeyeke navîn ên lihevhatina rastîya zarokan in û metinên vegêranê yên di pirtûkên dersê yên pola 5an ên tirkî ya Anıttepe da xwedî rêjeyeke navîn in û ya Koza jî xwedî rêjeyeka navîn a lihevhatina rastîya zarokan in.

Li gor van encaman rêjeya lihevhatina metinên vegêranê di her sê pirtûkên Wezareta Perwerdeya Neteweyî da li rastîya zarokan navîn derketîye û ev xal ji bo her sê pirtûkan jî ev kêmasîyek e. Li gor van destkeftîyên vekolînê mirov dikare van xalên jêrê pêşnîyaz bike:

Nivîskarên ku ji bo zarokan metinên vegêranê yên li pirtûkên dersan dinivîsînin lazim e zarokan ji nêz ve nas bikin û li gor geşedana wan, û rastîya zarokan metinên vegêranê bihûnin.

Rastîya zarokan, ji bo zarokan bi modelekî ve nayê sînordarkirin û civak bi civak jî diguhere loma ji bo çarçoveya bernameya hînkirina dersa kurmancî li gel rastîya zarokan lazim e guhertokên wekî civaknasî, erdnigarî, felsefe, derûnnasî, geşedana zarokan jî li ber çavan bên girtin û li gor van xalan çarçoveya bernameyan bên amadekirin.

Gava ku metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî da hatine analîzkirin derketîye holê ku rêjeya lihevhatina metinên vegêranê yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola 5an da li rastîya zarokan di hin metinan da kêm maye û di hin metinan da zêde ye lê belê di piranîya metinan da di rêjeyeke navîn da maye. Lazim e hevrengîyek di navbera metinên vegêranê da hebe û hemû metin li gor rastîya zarokan bên amadekirin.

Metinên vegêranê yên dersa kurmancî ji xeynî pênc çîrokan ji pêkenokên sê çar hevokî ve pêk tên û fablan bi

tevahî ji pêkenokên sê çar hevokî ve pêk tên lazim e metinên vegêranê yên xwedî çîrok li gor qaîdeya rastîya zarokan bên hûnandin û di nav metinên pirtûka dersa kurmancî da cih bigrin.

Gava ku li metinên pirtûkên îngîlîzî yên pola 5an ên Wezareta Perwerdeya Neteweyî tê nerîn tê dîtin ku di pirtûkên îngîlîzî da metinên vegêranê cih negirtine, di pirtûkên îngîlîzî da tenê metinên çêkirî yên pedagojîk cih girtine. Di metinên pirtûkên îngîlîzî da zimanekî pir sade tê bikaranîn û peyvên ku tên bikaranîn jî yên hêsan û rojane ne. Di pirtûkên îngîlîzî da hem metin hem jî peyv li gor serenava unîteya ku tê hînkirin tên bikaranîn. Perwerdeya bi zimanê îngîlîzî di xwendingehan da ji pola 2. destpê dike lê belê dîsa jî ji ber ku perwerdeya xwendingehê ne bi vî zimanî ye çarçoveya bernameya perwerdeyê li gor van şert û mercên perwerdeya xwendingehê tên amadekirin. Gava ku li metinên pirtûkên tirkî tê nerîn tê dîtin ku gelek metinên vegêranê di pirtûkan da cih girtine lewra ji pola yekem heta pola 5an bi zimanê tirkî perwerde tê dayîn û ji xeynî vê jî perwerdeya hemû dersên xwendingehê bi vî zimanî tê dayîn. Gava ku metinên vegêranê yên kurmancî bên amadekirin lazim e şert û mercên perwerdeya vî zimanî li ber çavan bên girtin. Lewra perwerdeya şert û mercên zimanên din û ya kurmancî ji hev cuda nin. Xwendekarên ku di xwendingehan da dersa kurmancî hildibijêrin bi malbata xwe ra bi kurmancî biaxivin jî neaxivin jî cara ewil rastî perwerdeya bi vî zimanî tên. Heta pola 5an zarok rastî perwerdeya bi kurmancî nayên. Zimanê vê pirtûka dersa kurmancî ji bo xwendekarên ku kurmancî dizanin zimanekî sade û heta astekê meqbûl be jî ji bo kesên ku cara ewil rastî vî zimanî tên lazim e li gor şert û mercên xwendekaran guncaw bibe. Gava ku metinên vegêranê tên amadekirin lazim e hem çîroksazîya metinan hem jî zimanê ku di metinan da tê bikaranîn li gor van şert û mercên xwendekaran bên amadekirin. Ev xal ji bo xîtapkirina rastîya zarokan jî xaleke mihîm e. Pirtûk çiqas xitabî zarokan bike ewqasî mifadar û kêrhatî dibe. Gava ku xebat li ser van mijaran hat kirin lazim e ev xala giring li ber çavan bên girtin.

## Çavkanî

Ackermann, E. (2004). *The whole child development guide.* Denmark: Lego Company.

Bakırcıoğlu, R. (2012). *Eğitim ve psikoloji sözlüğü.* Ankara: Anı Yayıncılık.

Bee, H. & Boyd, D. (2009). Çocuk gelişim psikolojisi. (Çev. Okhan Gündüz). İstanbul: Kaknüs Yayınları.

Can, D. T. (2014). Çocuk edebiyatı kuramsal yaklaşım. Konya: Eğitim Yayınevi.

Cansız, A. M. (2014). Nitel veri toplama araçları. M. Metin. (ed.), *Eğitimde Bilimsel Araştırma Yöntemleri* (s. 337-371). Ankara: Pegem

Cirhinlioğlu, F. G. (2010). Çocuk gelişimi ve ruh sağlığı, okul öncesi dönem. Ankara: Nobel Yayın Dağıtım.

Çepni, S. (2012). *Araştırma ve proje çalışmalarına giriş.* Trabzon: Celepler Yayıncılık.

Çer, E. (2014). *Edebiyatta çocuk gerçekliği ve çocuğa görelik ilkelerinin incelenmesi*, [Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü]. Ankara.

Çer, E. (2016).Türkçe öğretiminde çocuğa görelik ilkesine uygun edebiyat yapıtlarının önemi. *İlköğretim Online*, *15*(4). Doi: 10.17051/io.2016.22814

Çiftçi, Ö. & Çeçen, M. A. (2007) İlköğretim 6. sınıf Türkçe ders kitaplarında yer alan metinlerin tür ve tema açısından incelenmesi. *Milli Eğitim Dergisi*, 173, 39-49.

Eroğlu, Z. D. (2016). Çocuk kitapları ve okuma alışkanlığı. *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, *9*(44), 105-115.

Gökhan, B. & Bulut, K. (2024). Vekolînek li ser cureyên bêjeyan metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da. *Kurdiyat,* (10), 121-142

Gökmen, B. (2017). Ödüllü çocuk edebiyatı yapıtlarının çocuk edebiyatının temel öğeleri bakımından incelenmesi. [Yayınlanmamış yüksek lisans tezi]. Ankara Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü.

Gönen, M. & Veziroğlu, M. (2013). Çocuk edebiyatının genel hedefleri. Mübeccel Gönen (Edt.). Çocuk Edebiyatı. Ankara: Eğiten Kitap.

İpşiroğlu, Z. (2013). *Gelin çocuklar birlikte düşünelim.* İzmir: Tudem Yayınları.

Karasar, N. (2012). *Bilimsel araştırma yöntemi: Kavramlar, ilkeler, teknikler*. NobelAkademik Yayıncılık.

Kıbrıs, İ. (2016). Çocuk edebiyatı. Ankara: Kök Yayıncılık.

Kurt, Ş. (2024). Analîza metinên pirtûka kurdî (kurmancî) ya pola pêncem ji alîyê hînkirina şiyanewerîya xwendinê ve. Şarkiyat İlmi Araştırmalar *Dergisi, 16*(01), 461-472

MEB (2006). İlköğretim Türkçe Dersi (6, 7, 8. Sınıflar) Öğretim Programı. Ankara: Milli Eğitim Basımevi.

MEB (2019). *Türkçe Dersi Öğretim Programı (İlkokul ve Ortaokul 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7 ve 8. Sınıflar).* Ankara: Milli Eğitim Basımevi.

MEB (2024). *Ortaokul T*ürkçe Dersi Öğretim Programı (5, 6, 7 ve 8. Sınıflar)*.* Ankara: Milli Eğitim Basımevi.

MEB. (2012). *Ortaokul ve İmam Hatip Ortaokulu Yaşayan Diller ve Lehçeler Dersi (Kürtçe) Öğretim Programı.* Ankara: Milli Eğitim Basımevi.

MEB. (2015). Çocuk gelişimine giriş. Ankara.

MEB. (2015). *Türkçe Dersi (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7 ve 8. Sınıflar) Öğretim Programı.* Ankara.

Miles, M. B. & Huberman, A. M. (2015). *Genişletilmiş bir kaynak kitap nitel veri analizi* (S. Akbaba Altun ve A. Ersoy, Çev.). Pegem Akademi Yayınları.

Miller, P. H. (2008). *Gelişim psikolojisi kuramları.* (Çev. Zeynep Gültekin). Ankara: İmge Kitapevi.

Özdemir, E. (1983). *Okuma sanatı: Nasıl okumalı, neler okumalı*. İstanbul: Varlık.

Patton, M. Q. (2014). *Nitel araştırma ve değerlendirme yöntemleri* (M. Bütün ve S. B. Demir, Çev.). Pegem Akademi Yayınları.

Piaget, J. (2010). *Çocuğun gözüyle dünya.* (Çev. İsmail Yergüz). Ankara: Dost Kitapevi.

Sahilli, Y. (2022). *Aytül AKAL'ın romanlarında çocuk gerçekliği.* (Yayımlanmış Yüksek Lisans Tezi). Dokuz Eylül Üniversitesi, Eğitim Bilimleri Enstitüsü. İzmir.

Senemoğlu, N. (2015). *Gelişim, öğrenme ve öğretim, kuramdan uygulamaya.* Ankara: Pegem Akademi.

Sever, S. (2023). Çocuk ve edebiyat. İzmir: Tudem Yayıncılık.

Şen, E. (2024). Çocuk edebiyatında kurmaca gerçeklik. Ankara: Nobel Akademik Yayıncılık.

Şimşek, E. (2004). Çocukluk dönemi dini gelişim özellikleri ve din eğitimi. *Din bilimleri Akademik Araştırma Dergisi* 4/4 (Ağustos 2004): 207-220

Şirin, M. R. (2016). Edebiyat ve çocuk edebiyatı, edebiyatın amacı ve işlevi. *Türk Dili Dergisi*, *CX* (780), 12-31

TDK (2011). *Türkçe sözlük.* Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

TÜBA (2011). *Türkçe bilim terimleri sözlüğü.* Ankara: Yeni Reform Matbaacılık.

Yavuzer, H. (2012). *Bedensel, zihinsel ve sosyal gelişimiyle çocuğunuzun ilk 6 yılı*. İstanbul: Remzi Kitabevi.

Yıldırım, A. ve Şimşek, H. (2021). *Sosyal bilimlerde nitel araştırma yöntemleri.* Seçkin Yayınları.

Yücel, C. (2024). *5an s*ınıf Türkçe ders kitaplarındaki hikâye edici metinlerin çocuk gerçekliği açısından incelenmesi. (Yüksek Lisans Tezi). Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi. Van.